



DERSIM – Gesellschaft für Wiederaufbau e.V. gemeinnützig

Komela newe Virastena Dersimi
Komela ji nû ve avakirina Dersimê
Dersimi yeniden inşa cemiyeti
Holweider Str. 40, 51065 Köln
Tel.: 0221 6160 611
www.dersim-wiederaufbau.de

Komelaya Dersimê li dijî AKP ê serî hilda: Ev şerê Dêrsimiyên li dijî Tunceliyan e!

Îro, „**Komela ji nû ve avakirina Dêrsimê**“ bi munasebeta hilbijartinên li Tirkîyê û Kurdistanê beyanek belav kir. Beyana Komela Dêrsimê ku bi îmzeya nivîskar Haydar Işık hatiye belavkirin, wisa ye:

„Ji raya giştî ya demokratîk re

Hilbijartinên 29 ê Adarê ji bo avakirina rêvebiriya herêmî ya azad gelekî giring e. Ev hilbijartin dê îradeya gelê me nîşanî dost û neyaran bide. Hilbijartin di bingeha xwe de di navbêra dewlet û partiya gelê Kurd DTP ê de derbas dibe. Partiya Dewletê AKP, alavên malê û rûşwetan di nava gelê me yê hatiye hejarkirin de belav dike û namzêtên xwe dide pêş. AKP dixwaze bi vê yekê deng û yekîtiya gelê me perçe bike.

Divê bê pirsîn: Di vê hilbijartinê de berê kê dikeve hemberî hev?

- Di vê hilbijartinê de, Dêrsimiyên Seyid Riza û Tunceliyên dewletê tên hemberî hev.*
- Ev hilbijartin, di navbêra kesên qirkirina Dêrsimê ronî dikin û yên ku dixwazin bidin jibîrkirin derbas dibe.*
- Du nerîn di hilbijartinê tên hevberî hev; xwestina DTP ê ya xwe îdarekirina demokratîk û israra xwestina „sîstema yek rengî“ ya dewletê.*
- Ev hilbijartin, di navbêra Kurdên demokratîk û baweriya Turk Îslamiya Fethulahvan an de derbas dibe.*
- Ev hilbijartin, di navbêra DTP ya aştxwaz û AKP ya şerxwaz de derbas dibe.*
- Ev hilbijartin, di navbêra DTP ya ku dixwaze îradeya gelê Kurd bide nîşandan û dewleta dixwaze wê îradeyê tune bike, derbas dibe.*
- Ev hilbijartin, di navbêra dilxwazên azadiya Kurdan û kêsên dixwazin wan kole bihêlin de derbas dibe.*

Bi kinahî, ev hilbijartin ji bo me Kurdan gelekî giring e. Partiyên dewletê AKP û CHP ji bo ku dengên Kurdan perçe bikin, planên guhertî pêk dihênin. Li ser navê çepîtiyê, kesên di xizmeta dewletê de ne didin pêş. Dixwazin xwûrtbûna me qels bikin.

Serekomar Erdogan baş fêm kir ku dengên Dêrsimiyan bi pere û ruşwetan nayê kirîn. Niha jî bi rêya kesekî ku çeparêzekî turk e, gavan davêje.

Banga me ji xelkê me re ew e ku, hilbijartinê cidî bigirin û dengê xwe nedin AKP û CHP ê. Dengên xwe nedin çeparêzên turk. Divê Dersimî dengê xwe bidin namzetê DTP ê da ku ew, al a şerefa Dêrsimiyan bilind bike.

Banga me ji tevayê Gelê Kurd û Dersimiyên li derveyê welêt ew e ku, tevayên mecalên xwe bikar bihênin, herin welat û piştgiriya DTP ê bikin, bi rêya telefon û TV yê dengên xwe bighêjînin kes û nasên xwe da ku ew dengên xwe bidin DTP ê."

Zarathustra News – zarathustra_news@comhem.se